




Mehatima Gandî (1869- 1948)

Kêm serkirde - di dîroka cîhanê da hene hindî Gandî têkelî jîyana gelê xwe buwîne. Gandî ji bo Hindistanê wek barzanîyê nemir bû ji bo Kurdistanê. Wî bi jîyana xwe ya sade rewş û reftara xwe ya pak u nefreta xwe ji tundû tûjîyê gelê Hindistanê hişyar kir û serkêşîya xebata wî ji bo azadî û serxwebûnê kir. Navê wî ((Muhendis Karamşand Gandî)) ye. Li sala (1869) ê li bajêrê ((Borbandar)) ji dayîk bûye. Di nozde salîya xwe da çûye Bîrî-tanya û dest bi xwandina qanûnê kirîye. Piştî xwandina xwe bi dû mahî înayî li kumpanîyeka bazirganî ya hindî li Başurê Efrîka hatiye damezrandin. Gandî li wêrê sitem û zordarî bi kirêttirîn şêwe dît û li wêrê biryar da ku hemî temenê xwe yê mayî bikete di xizmeta xebata dijî sitemê da. Gandî mirovekê aştxwaz bu û xebata xwe bi awayekê aşî û dûr ji tund û tûjîyê dikir û ji ber hindê jî bû cihê rêzgirtina hemî cîhanê. Li sala 1921 ê daxwaz ji hemî xelkê Hindistanê kir ku dest ji karî berden û hîç berhemekê Bîrîtanî nekirin û bi vê çendê jîyan li Hindistanê niv - rawestayî ma. Gandî ji ber van helwîstên xwe çendîn caran hate girtin û kete di zîndanê da.



Gandî bu serokê (partîya Kungra Nîştîmanî ya Hindî) vê partîyê serkêşîya xebata Hindistanê dijî dagîrkerên engilîz bi şêweyekê aşî kir û Hindistanê li sala (1947) ê serxwebûna xwe wergirt. Dema arêşe û nexweşî di navbera musliman û Hindosan da derketin Gandî - bê layengelek hewl da ku navbera wan xweş biket lê hewlên wî sernekeftin û pakistan û paşî Bengladiş jî ji Hindistanê cuda bun. Sera van helwîstên wî tundirewekê Hindosî li roja 30/1/1948 ê di nav kombûneka mezin da li Nîwdelhî da

